

NANDINE

KURDISH FOOD

KURDÎ

The Hall

NANDINE ◀

Li Londonê

Mitbaxeke Kurdî

Çiroka Kebaniya Kurd

Pary Baban

Resepsiyona ◀

Newrozê

Erol Başak

Şer û Zarok ◀

Siyabend ASLAN

Jin û Tolhildan ◀

Necat Zivingî

Hişê Çêkirî yê Kurdî ◀

DigiKurd

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 4, Nîsan 2022

Damezrîner

Osman Kômürcü
Erol Başak

Editor

Erol Başak

Rûpelsazî

Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

Bergsazî

GrafiKURD

Navnîşan
London UK

The Hall Kurdî

Endama Koma
Kovargerên Kurd e

www.thehallkurdî.com

thehallkurdî@gmail.com

+44 7915 413436

@KurdîHall

TheHallKurdî

The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.
Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe berpîrsin
û ne mecbûr in ku ew mîna yê wêşanger û edîtor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,
materyal û naverokên din bi niyetêke safî hatine amadekirin.*

NAVEROK



Nameya Edîtor

Newroza Siltanî
Darê Gopalê Xwe Hilanî
Bihar û Zivistan Ji Hev
Deranî...

Erol Başak ▶ 42



Hişê Çêkirî yê Kurdî
Hevpeyvîn bi Keyo Yehya
Çalî re

DigiKurd ▶ 20



Resepsiyona Newrozê Li
Parlamentoya Brîtanyayê

Erol Basak ▶ 5



Hûnera Dijîtal

Hogir Ar ▶ 25



Li Londonê
restoranteke Kurdî:
NANDINE

Nûçe: Erol Başak ▶ 9



Ji bo Boomeran
NFT Çi ye ?

Aram Tastekin ▶ 29




ZAROK Û ŞER

Drn. Siyabend ASLAN ▶ 14



Çîroka vegerandina
guran û modêlek mîna wê
li Bakurê Sûriyeyê

Daleel Hagy ▶ 32



Jin û Tolhildan

Necat Zivingî ▶ 17



Bêhêvîf Qedexa ye

Ji Tirkî: Zana Zengenî ▶ 35

NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

Newroza Siltanî

Darê gopalê xwe hilanê

Bihar û zivistan ji hev deranî.

Bihar hat, bi Newrozê miletê Kurd kete saleke nû. Li her cihên ku Kurd lê ne Newroz bi coş hate pîrozkirin. Bêguman coş û ahenga herî xweş û rengîn li Akreyê bû. Dîmenên li bajarên Kurdistanî xweziyên me Kurdên li xeribiyê anî.

Lê îsal ji ber ku qedexeyên pandemiyê rabûn, civaka Kurdên li Britanyayê jî bi çalakiyên cur bi cur Newroz pîroz kir. Bes li Londonê ji 21ê Adarê pê ve heya dawiya mehê her roj çalakiyên Newrozê hebûn. Gelê Kurd li parkan û li komelayên xwe, xwendekaran li zanîngehên xwe Newroz pîroz kirin.

Bi boneya Newrozê Center for Kurdish Progress jî li Parlamentoya Îngilîstanê resepsiyona Newrozê li dar xist. Kurdên li Britanyayê û siyasetmedarên Kurd bi cil û bergên Kurdî beşdarî resepsiyonê bûn. Ji hemû partiyên li Britanyayê jî nûner hatin resepsiyonê û dostaniya xwe ji bo Kurdan nîşan dan. Hûrguliyên şevê di nûçeya resepsiyona Newrozê de ye.

Di vê hejmarê de em behsa jineke Kurd a serkeftî dikin. Di berga kovarê de jî ew û restoranta wê heye. Pary Baban xelka Qaladze ya Başûrê Kurdistanê ye. Ji komkujîya rejîma Baasê û bombebaranana Seddam reviyaye û hatiye li Londonê bicî bûye. Di dema rêwitiya koçberiyê de li her gund û bajarên Kurdî ku lê maye terîfên xwarinên Kurdî berhev kirine. Niha ew xwarinên Kurdî di restoranta xwe ya bi navê Nandine de çêdike. Mîsyona wê nasandina xwarinên Kurdî û dewlemendiya mîtbaxa Kurdan e.

Dîsa di kovara Nîsanê de em projeya hişê çêkirî ya Kurdî didin nasîn. Di hevpeyvîna me ya bi Keyo Yehya Çalî yê hevdamezrînerê Ovanayê re de hûnê hemû hûrguliyên hişê çêkirî yê Kurdî bibînin.

Hunera dijîtal û NFT mijarên din yên vê hejmarê ne. Hûnermendê serkeftî Hogir Ar ji bo xwendevanên me bi gotarekê behsa hunera dijîtal kir.

Hunermendê NFTê Aram Taştêkî bersiva pirsên derbarê NFTan de bersivand: Ji bo Boomeran NFT çi ye ?

Nivîskar Necat Zivingî di nivîsa "Jin û Tolhildan" de rexne û krîtîka pirtûka Ferhat Pîrbal ya Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr dîke.

Derûnnas Siyabend Aslan ji bo The Hall Kurdiyê nivîsand: Şer û Zarok. Di dema şerî de zarok çawa jê tesîrdar dibin û ji bo parastina derûniya wan lazim e çi bê kirin. Mamoste Siyabend di nivîsa xwe de behs dîke.

Projeya dar çandinê li Rojava û herêma Kurdistanê, Trees Against Poverty, bi goterekê nû berdeyam tê vegotin. Daleel Hagy mînaka vegeîna guran ya li parka Yellowstonê dide û dibêje guhertineke bi wê şiklê bi çandina daran li bakurê Sûriyê jî pêkan e.

Kovara Nîsanê bi wergereke helbestvan Zana Zengenî bi dawî dibe: Bêhêvîti qedexa ye!

Bi hêviya bihareke bi ber û bereket..

Bi Kurdî bifikirin, bi Kurdî bixwînin û bi Kurdî binivîsin...

RESEPSIYONA NEWROZÊ LI PARLAMENTOYA BRÎTANYAYÊ

EROL BAŞAK

Newroz li Londonê îsal bi coş û ahengeke mezin hate pîrozkirin. Piştî du salên ku ji ber tevdîrên nexweşiya koronayê tu çalakiyên civakî nehati-bûn kirin, hikûmeta Îngilîstanê di sala 2022an de hemû tevdîr û qedexeyê rakirin. Herwisa tu asteng li ber kombûn û çalakiyên civakî neman. Center

for Kurdish Progress jî bi boneya Newrozê li Par-
lamentoya Brîtanyayê resepsiyonek organize kir.
Mazûvanên şevê yekemîn Parlamentera Jina
Kurd û Elewî Feryal Clark û Parlamentera Partiya
Conservative (Muhafezekar) Alicia Kearns bûn.



Danezena resepsiyonê ji ser aplîkasyoneke çalakiyan hate kirin. Serlêdan û beşdarî bêpere bû lê tenê qeydbûn mecbûrî bû. Di bangewaziyê de hat gotin ku divê kincên kokteylan, taxim an jî cilê Kurdî bîn lixwekirin. Serlêdan gelek zêde bû. Di dema têketina hûndir de li ber deriyê eywana Attlee Suite ya Parlamentoya Îngilîstanê doreke dirêj çêbû. Gava kapasîteya hûndir tije bû jî derî hate girtin û hejmareke zêde mêvanên di dorê de li derve man.

Ji her partiyên Brîtanayê parlamenter an jî nûner beşdarî resepsiyona Newrozê bûn.

Feryal Clark- Parlamenter: Ev 14-15 sal in her sal, heyama kovîdê ne tê da, li parlamentoya Brîtanayê bi boneya Newrozê resepsiyon û pîrozbahî çêdibe. Wekî tê zanîn li her deverên Îngilîstanê û nexasim li Londonê gelek Kurd hene. Civaka Kurdan li vir civakeke qerebalix e. Ji loma her sal em resepsiyonê li dar dixin. Piştî pandemiyê ev yekem pîrozbahî ye. Loma bi beşdariyê mezin şahiyê mezin çêbû. Ji gelek partiyên gelek parlamenter beşdar bûn. Ji partiya Labour, ji partiya Censervative, ji partiya SNP ya Îskoçyayê, ji partiya Demokratên Lîberal, ji partiya Keskan parlamenter hatin. Gelek endamên meclîsê û ji gelek civakan nûner hatin resepsiyonê. Ji civakên Kurdan yê li Brîtanayê û ji çar perçeyên Kurdistanê nûner hatin. Resepsiyoneke pir qerebalix û bi çoş pêk hat.

Feryal Clark di axaftina xwe de got ew gotina ku “ji bilî çiyayan dostê Kurdan nîne” êdî ne rast e.

Heke hûn li hejmara hevalên Kurdan yê hatine vê resepsiyonê binêrin, heke hûn guhdariya axaftinên wan yê li parlamentoyê binêrin, hûnê bibînin ku di nava her partiyên de dost û piştgirên Kurdan hene. Her yek ji wan pirsgerêk û problemên Kurdên li herêmên xwe tînin rojevê. Ji loma jî divê em van dostên xwe jibîr nekin. Bi min divê em wê biwêjê hêdî hêdî biguherînin. Bi rastî jî dostên Kurdan hene. Li parlamentoya Îngilîstanê bi rastî dostên Kurdan hene. Ez wek Kurdekê tenê nîn im. Hejmareke zêde dostên me hene.



Wezîrê Perwerdehiyê Nadim Zahawî jî di resepsiyonê de axaftinek kir. Zahawî li ser girîngiya Newrozê sekinî û bangewazî li Kurdan kir ku bila bikevin siyasetê. Wezîr Zahawî got fikra we ya siyasî çî dibe bila bibe têkevin siyasetê.

Bi saya resepsiyona Newrozê ji her parçeyên Kurdistanê nûnerên Kurdan û siyasetmedarên Kurd di şevê de hazir bûn. Parlamenterê





berê yê HDPê Osman Baydemîrê ku ev demê li Îngilîstanê bi cî bûye yek ji wan bû. Osman Baydemîr hevpeyvînek kurt da The Hall Kurdîyê. Baydemîr got; “Ez hêvî dikim ku ev Newroza han bibe bingeha avakirina tifaqa netewî ji bo miletê Kurd.”

Bi rastî 40 milyon Kurd li her deverê cihanê dijîn û Kurd êdî li her çar aliyê cihanê bi rêxistin in. Xwedî xwedan in, xwedî fikr in û li fikr û ramanên xwe xweyî derdikevin. Îro li parlamentoya Brîtanîya ez gelek kêfxweş im ku ez parçeyekî pîrozbahîya Newrozê me. Ez jî weke mêvanekî li vê axê me. Herwiha ez dikarim bêjim ku yek ji taybetiyên vê şevê jî ev e ku ji her siyaseta Kurd û ji her çar perçeyên Kurdistanê hemû hizb îro lere ama-

de ne. Û dikarin bi sedemekê bêtin cem hevdu. Ew tê wê maneyê ku sedem hene ku Kurd bibin yek. Fersend hene ku Kurd bibin yek û tifaqa xwe pêk bînin. Ez hêvî dikim ku ev Newroza han bibe bingeha avakirina tifaqa netewî ji bo miletê Kurd û Kurdistanî. Û bi taybetî tu mişkulat di nava miletê Kurd û Kurdistanî de nîne. Mişkulat di nava hizban de ye. Ez hêvî dikim ku Newroz bibe wesile ku ev mişkulat û kêşeyên di nava hizban de hebe bêtin çareserkerin ku hizb jî karibin di hestên netewî de û di berjewendiyên neteweyên Kurd de bikaribin bigihîjin hevdu, pêşerojê azad ji bo miletê xwe ava bikin. Herwiha di nava hizbên Kurd û Kurdistanî de tifaq pêk neyê mixabin dijminê Kurdan dê vê nakokiyê li dijî Kurdan bikarbînin. Ji ber vê jî tifaq tê mena azadiyê, tifaq tê mena wekhevîyê û tifaqa Kurdan tê menaya aşî li rojhilata navîn. Tifaqa navbera Kurdan çawa ji Kurdan re azadî bîne herwisa wê ji miletê Erebb û Tirk û Farisan re jî aşî bîne, wê sulhê bîne û demokrasîyê bîne. Ji bona vê yekê bila tu kes ji tifaqa Kurdan netirse. Banga min ew e ku bila her kes piştgirî bide tifaqa Kurdan; da ku mişkulat çare bibe, wê xwezayî ava bibe, wê sulh ava bibe, wê dewlemendî ava bibe. Ji bona wê yekê tifaqa Kurdan berjewendîya hemû miletan e.



Yek ji amadekarên şevê Navenda Demokratîk a Kurdan li Brîtanayê bû. Hevseroka vê navendê Elif Sarican jî di resepsiyonê de axivî. Saricanê got; “Pîrozkirina cejna Newrozê li parlamen-toya Brîtanaya ji bo me pir girîng e.”

Newroz ji bo gelê Kurd ne tenê cejn e, ji bo me wek sembola berxwedan û sembola şoreşa me ye. Ew semboleke nasnameya me ye jî. Û ji loma pîrozkirina cejna Newrozê li parlamentoya Brîtanaya ji bo me pir girîng e. Hevalên me yên parlamenter hatin, jin hatin, ji welatên din, millet hatin. Ev çalakî ji bo me tê wateya piştgiriya ji bo gelê Kurd, tê wateya bangewaziya azadî û aştîya Kurdan. Me îro dîsa mesaja xwe ji bo Kurdan, ji bo demokrasî, ji bo jinan, ji bo ekolojîyê û ji bo Kurdistanê dubare kir. Ji bo azadiya serokê gelê Kurd Abdullah Ocalan jî me peyama xwe dubare kir. Me got azadiya Serok Ocalan ji bo aştî û azadiya Kurdan tiştê herî girîng e.

Şaredarê berê yê navçeya Harringay a Londonê Ali Gûl Ozbek jî hestên xwe ji bo kovara me wiha bi lêv kir.

Îro me dît ku Newroz çiqas rojêke girîng e, rojêke wisa ye ku Kurdan tîne cem hev. Gelê Kurd mecbûr e bibe yek. Em Kurd li kîjan deverên cîhanê bibin jî, partî, bawerî, nêrîna me ya siyasî çî bibe jî di bin sîwana Kurdbûn û Kurdistanîbûnê de divê em werin cem hev. Ji loma bangewaziya me ji hemû Kurdan re ev e: Hûn mecbûr in werin ba hev û bibin yek. Nêrînên siyasî û baweriyên xwe bidin aliyekî û di bin nasnameya Kurdistanê de werin ba hev. Ji bo vê armancê berxwe bidin, mirovan, rêberan û partîyan bînin ba hev.

Di resepsiyonê de xwarin û vexwarin jî hatin dayîn. Piştî axaftinan digel mûzîka Kurdî beşdarên govend jî gerandin. Resepsiyona Newrozê ya li parlamentoya Brîtanayê ji her aliyên Kurd û dostên Kurdan li hev civandin. Kurdan resmeke yekgirtî derxist holê.

Bi hêviya ku Newroza Sultanî tifaqa Kurdan ava bike..



LI LONDONÊ MITBAXEKE KURDÎ: NANDINE

NÛÇE: EROL BAŞAK

Pary Baban kebaniyeke serkeftî ya Kurd e li Londonê û bi navê Nandine du restorantên wê hene. Nandine peyveke orjînal a Kurdî ye û tê wateya mitbaxa roja îro. Di mitbaxa Pary Babanê de tenê û ji sedî sed xwarinên Kurdî dipijin.

NANDINE

KURDISH FOOD

№ 45





Çiroka Pary bi bombebarana rejîma Baasê destpê dike.

Sala 1988an êrîşeke mezin bi ser bajarê wê Qaladzê de tê kirin. Bajar tê rûxandin. Dora 500 mal jê koç dikin. Malbata Paryê jî koçê Îranê dike, ew diçin cem xizmên bapîrê wê yên li Serdeşt, li Rojhilat.

-Em ewil çûn çiyayê Qendîlê. Ji gundên derdorê Qendîlê derbas bûn. Li her gundekî xwarinên nû bala min kişandin. Cara pêşî min xwarina dandok li maleke li ser sînore Giwêzê xwar û zor xweş bû. Li Serdest xelk diçin zozanan penîr çêdikin, dims çêdikin, xwarinên kurdewarî çêdikin. Beleşok min li wir dît. Kundiran perçe dikin, li ber tavê hişk dikin û dims dikin ser û wisa dixwin. Jê re dibêjin beleşok. Yekem car li mala mamekî bavê min sengesîr dît. Genim û birinc û nîsk û nok hemû dikelînin û goştê kîvroşkê dixin nave. Zor xweş bû. Li Serdeşt, Xane, Mûkriyan ev xwarin tê çêkirin. Dişibe kelecoşê lê ferqa wê goştê kîvroşkan e.

Lê meraqa wê ji xwarinan re hêj di piçûktahiyê de heye. Dapîr û xaleta wê kebaniyên baş bûne. Pary ji dapîra xwe fêrî çêkirina xwarinan bûye. Cara yekem jî 13 saliya xwe de xwarin çêkiriye.

-Rojek mêvan hatin. Bapîrê min got xwarin çêke. Şêx Sedredîn hatibû, mezinê herêma Qaladzê bû. Kes li mal nebû. Lê xaleta min ji êvar de yaprax hazir kiribû. Bapîra min got tu dest pê bike ez ê aliyê te bikim. Min çend xwarin çêkirin. Hemû xweş hatin. Min yaprax jî çêkir. Lê ji ber ku min av hindik xistibû hemû yaprax şevitîbûn. Meraqa min ji çêkirina xwarinan re di piçûktahiyê de hebû. Her tim diçûm ber tenûrê min li dapîra xwe û xaleta xwe dimeyîzand ka çawa nan dipêjînin. Dapîra min doşav û hesîle xweş çêdikir.


Pary Baban di 17 saliya xwe de dibe koçber. 4 sal li rojhilat dimîne. Li her gund û bajarê ku lê dimîne bala xwe dide xwarinên wan û gava xwarinên nû dibîne terîfên wan di deftera xwe de dinivîse. Her wisa terîfên 25 xwarinan tomar dike.



-Ez diçûm zanîngehê lê ji ber bombebaranê xwendina min nîvco ma. Gava em ji Qaladzê derketin min defterek bi xwe re bir. Li Qendîlê xelkê li ser daran roja ku ji wir derbas bûne xêz dikirin. Min jî nivîsand. Min got heke rojek vegerim ez ê lê binêrim. Di rêwitiya ber bi Serdeşt de gava min xwarinek dîdît min terfên wan hildida û dinivîsand. Li Giwêzê em ligel malbatekê man. Xanima malê bi şev savar çêkir û gelek giyayên ji çiyê xiste navê. Zehf xweş bû. Min qet tas kebabi nedîtibû. Wî tas kebabi çêkir. Gelek tesîr li min kir. Min cara pêşî terfê wê nivîsand. Catir (kekîk) hişk kiribû. Û ji wê catirê xistibû nava xwarinê. Tehma wê zor xweş bû.

Di sala 1995an de biryar didin û tîn Londonê. Pary bi zarokê xwe yê diduyan ducanî bû. Mêrê wê li taxa Elephant and Castleê malek dikire. Dîsa li wê deverê dezgeheke piçûk vedike û li ser kolanekê rojname, sandvic difroşe. Pary ji aliyekê ve telbê zarokên xwe dike ji aliyê din ve li ba mêrê xwe dixebite. Lê dest ji xwendinê û xwe gihandinê bernade. Diçe qursa Îngilîzî, diçe qursa por birînê, diçe qursa terapiya xweşikbûnê. Lê xeyala wê ew bû ku di-xwest restoranta xwe veke.

-Li ser dezgehê, me tenê rojname, çoleta, cîps tiştên wisa difrot. Lê Xelkê dip-





irsiya çima tu sandvîcê dirûst nakî, çima çay nayînî, çima qehwe nayînî. Sandvîcên hazir dihatin lê ne xweş bûn. Min ji mêrê xwe re got em çima ya xwe çênakin? Min li malê qutilk çêkirin û kirine nava nanê wek sandvîc min firot. Xelkê gelek jê hez kir. Piştê min pincar sor kir li malê ligel hêlkew, piyaz û zerdeçal min xiste nava nanê Kurdî. Gelek hate ecibandin. Dûvre min yaprax çêkir. Xelkê zor jê hez kir.

Û axir di sala 2016an de li Camberwellê Paryxanê restoranta xwe vekir. Ew tarifên ku bi salan berhev kiribû û di deftera wê de disekiniya bi şewazeke modern xiste menûya restoranta xwe û niha bi tarza xwe servîsî xelkê Londonê dike. Li ser deriyê restorantê di binê tabelaya Nandine de “xwarinên Kurdî” dinivîse. Pary xan dibêje armanca wê nasandina xwarinên Kurdan e.

-Armanca min ew e ku xwarina Kurdî bi xeyrî Kurdan bidim nasîn. Wan qet qubilî reş, xelîs, kelana nexwariye. Kesên ku qet xwarinên Kurdî tehm nekirine tên li vir dixwin û dibêjin berî vê me xwarineke wiha nexwaribû. Loma ez dixwazim sifreya Kurdî têxim navbera sifreyên welatên din. Hindî, Italian, Îranî, Iraqî, Tirk xwedî sifreyên xwe ne. Lê sifreya xwarinên Kurdî nîne. Ez dixwazim xwarina Kurdî bidim nasîn. Firq nake çî ji Diyarbekir be, çî ji Silêmanî be, çî ji Mihabad be, çî ji Qamişlo be. Xwarinên Kurdî heman in. Em bi heman şewazê dipijînin.

Pary Baban ji bo jina Kurd a jêhatî û serkeftî nimûneyeke hêja ye. Û ew bixwe jî gelek girîngî dide pêşketina jinên kurd. Gava hûn dikevin hundirê restorana wê, tabloya jina Kurd ya li zozana Geverê pêşwaziya we dike.

-Di restorana min de çend sembolên Kurdî ne. Ev tablo nûneriya hemû jinên Kurd ji hemû perçeyên Kurdistanê dike. Em bihêz in, çî





be jî em dikarin bikin. Çi li restorantê be, çi li zeviyên be, çi li çiyên be ferq nake jina Kurd çi dil bike dikare tê de biserkeve. Ya diduyan gerdaniya jinên Kurd e li ser dîwêr. Ew bi mêxekan hatiye çêkirin. Em mêxekan wek biharat bikartînin. Û wek sembola evîni em pê sêva mêxekrêj çêdikin. Û ya sisêyan tizbiyê kizwan heye.

Wek xanimeke serkeftî çend şîretên wê bi taybetî ji jinên Kurd yên li xeribiyê re hene.

-Ya ewil ziman hîn bibin. Ziman nebe tu nikarî têkilî bi civakê re deynî. Çanda Kurdî de heye nahêlin derkeve derve. Hin ji ber zarokan hin ji ber mêrên xwe li mal dimînin. Ez dibêm tu carî dev jê bernedin. Bixebitin, xîret bikin. Îro nebe sibê hûnê biserkevin. Derketina derve çêtir e ji rûniştina li malê. Loma hînbûna zimên gelek muhîm e. Ziman dikare hemû deriyên ji we re veke.

Nandine yekem restorant e ku tenê xwarinên Kurdî çêdike. Restoranteke Kurdî û delal e. Heke rêya we bi Londonê bikeve teqez biçin vê restoranta şêrîn û ji xwarinên bi tehm ya Pary Babanê bixwin.

**Ji bo yên meraqê dikin jî ez navnişana wan li vir deynim:
45 Camberwell Church St, London SE5 8TR.**



ZAROK Û ŞER

DERÛNNAS SIYABEND ASLAN

drn_s.aslan@hotmail.com

Di dema aştîyê de zarok bavên xwe dispêrin axê,
di dema şer de jî bav zarokên xwe.

Krezûs



Wexta ku peyva “şer” tê bi-hîstin; rasterast mirin tê bîra mirov, birîndarbûn, windakirina nas û dost û hevalan, êş û kul û derd, tirs û xofa zêde... Îro bi mîlyonan zarok ji ber şer û pevçûn û aloziyên polîtîk dibin mexdûr û ev rewş bandoreke neyînî li wan dike. Ji ber ku derûniya zarokan gelekî hesas e; tesîra van şer û pevçûnên li dinyayê bêhtir li ser zarokan xuya dibe. Û helbet di rewşeke wisa de ev şer û pevçûn ji her aliyê ve li ser geşedana zarokan zereren mayînde jî dihêle. Ligel vê zarokên ku rasterast dûçarî şer û pevçûnan dibin an jî dibin şahid, herçiqasî bertekên ji hev cuda bidin xuyakirin jî ji ber pirs-girêkên derûnî tirseke zêde dijîn û dikevin nav bêçarefî û bêhêvî-tiyekê.

Herçiqasî zarokên ku dûçarî şer dibin li gorî temenê xwe bertekên cuda nîşan bidin jî bi gelemperî bertekên wisa tên xuyakirin: Pirs-girêkên xewê dijîn, digirîn, kabûsan dibînin, pirs-girêkên xwarin û vexwarinê dijîn, ji kesên xerîb ditirsin, bêdeng dibin, xwe ji civakê dûr dixin, zêde hêrs dibin û tevgerên êrîşkar didin xuyakirin, pirs-girêkên hevahengiyê dijîn, bi xwe de dimizîn, pirs-girêkên baldariyê û dibistanê dijîn, xwe îzole dikin, dikevin nav depresyonekê, xwe sûcdar hîs dikin û hwd.

Şer û pevçûn bi tena serê xwe trawmayek e û wekî ku tê dîtîn bi xwe re gelek pirs-girêkan jî tîne. Piştî trawmayê bo ku alîkariya zarokan bê kirin



hin midaxale pêwîst û girîng in. Şertê pêşî ew e ku cihekî ewle û aram bê peydakirin da ku ew zarok netirsin û dûçarî şidetê nebin. Û piştê divê hewcedariyên zarokan ên sereke (xwarin, vexwarin, kinc, hewcedariyên şexsî hwd.) bîn bidestxistin. Piştî vê îcar bo alîkariya derûnî pişt-giriya psîkososyal hewce ye. Di vir de xebatên psîkososyal gelekî girîng in. Armanca van xebatan ya sereke ew e ku zarok xwebaweriya xwe dîsa bi dest bixin, nîşet û bertekên neyînî yên zarokan kêmbibin, da ku zarok xwe di ewlehiyê de hîs bikin û xwe adapteyî jiyana rojane bikin. Ev xebatên psîkososyal ji aliyê kesên pispor ve tên kirin ku wan di vî warî de perwerde dftiye û dizanin bê çawa nêzî zarokan bibin û wan zarokan nas bikin. Hemû zarok ji hev cuda ne û bo ku ev xebat sûdewer bin, pispor li gorî şert û mercan û derûniya zarokan nêzî wan dibin û komên zarokan ava dikin. Di xebatên psîkososyal de çalakiyên weke wêne, drama, lîstik, muzîk, vegotina çîrokan, xwendina pirtûkan, dans û hwd. bo zarokan gelekî alîkar in. Bi saya van çalakiyan zarok dikarin hestên xwe bidin der û xwe baştir îfade bikin. Berpirsiyarî dikeve ser milên dêûbavan jî helbet. Divê bizanibin dê çawa nêzî zarokên xwe bibin û di rewşên wisa aloz de dê çawa tevbigerin. Di vir de alîkariya wan girîng e. Wexta ku zarok bixwazin li ser hest û fikrên xwe bi axivîn divê dêûbav gotinên wan nebirin, wan fêhm bikin, ji wan hez bikin û bidin xuyakirin ku ew zarok di ewlehiyê de ne û ne tenê ne.

Ji bilî zarokên ku rasterast an jî nerasterast dûçarî şer û pevçûnan dibin hin zarok jî hene ku bi rêya medyayê an jî bi axaftinên derdorê yên li ser ‘şer û pevçûnan’ dikevin nav tirseke mezin û tendirustiya wan a derûnî xirab dibe. Di vir de helbet berpirsiyariya zêde dîsa li ser milê dêûbavan e. Divê bê zanîn ku derûniya

zarokan gelekî hasas e û nûçe û axaftinên li ser şer li gorî temenê zarokan xwedî bandoreke neyînî ne. Di medyaya civakî de parvekirinên dîmenen şer, dîmenên hilweşandina cih û waran û kuştina kesên sivîl bo derûniya zarokan helbet ne baş in û anksiyeteya wan gelekî zêde dikin. Pirsgrêkên xewê dijîn, xewnên ne xweş dibînin, gelekî kûr difikirin, ditirsin, digirîn û hwd. Zarok çiqasî ji van nûçe, axaftin û parvekirinên li ser şer dûr bikevin û li ser pirsên ku zarok meraq dikin li gorî temenê wan bi awayekî zelal bê axaftin û bi sebr bînin guhdarkirin dê ewqasî ji aliyê tendirustiya derûnî ve bînin parastin.



“Şer û pevçûn” wekî rastiya jiyane her wext di jiyana me de ye û wisa xuya dike ku dê her wext jî hebe. Bi mirovahiyê destpê kiriye û wisa jî bi mirovahiyê re dom dike. Kesên ku gelekî zererê dibînin, jiyana wan serrobino dibe û tendirustiya wan a derûnî xera dibe zarok in. Berekî giran ku ji temenê wan zêdetir e dikeve ser milê wan. Dimirin, birîndar dibin, nas û dost û xizmekî xwe winda dikin, ji welatê xwe dûr dikevin dibin koçber, jiyana wan diguhere ku nabe wekî berê. Bo ku şert û mercên zarokan baş bibin û derûniya wan gelekî xerab nebe û bê dermankirin divê ji her aliyê ve bo zarokan polîtîkayên nû yên avaker bînin sazînin. Bi saya van polîtîkayan dê hewcedariyên van zarokan bînin bicihanîn da ku di pêşeroja xwe de xwe baştir his bikin û adapteyî jiyana xwe ya nû bibin.



JIN Û TOLHILDAN

NECAT ZIVINGÎ





Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr
Ferhad Pîrbal

avesta

Heft Wêney Rûtî Jinî Cenabî Wezîr: Pirtûka duyem ya Ferhad Pîrbal bû ku min xwend. Ya pêşî Hotel Europe bû. Êdî stîl û şewaza Ferhad Pîrbal dinasim. Hê ji hevoka pêşî de min hest kir ku ev pirtûk ya Pîrbal e. Mîna bîranîneke xwe dinivîse vedibêje. Jixwe lehengê romanê bi nav, kar û kesayet Ferhad bi xwe ye.

Romaneke 91 rûpel ku qet xwendevan nawestîne. Lêbelê hestên wisa çêdike; xwendevan naxwaze zû bi zû dawayê lê bîne. Tenê, tevî yên bergê heşt wêneyên di pirtûkê de, seriyan diêşînin. Qet nebe ji bo min wisa bû. Her kes û jîrtiya xwe êdî!

Ferhad dîsa xwînerê xwe dibe cîhaneke bi otêl, bar, entrîka, têkiliyên cinsî, wêne û hunerê xemilandî. Û helbet evîn. Cîhaneke cuda û balkêş.

Digel entrîka di romanê de heye jî, mîna Hotel Europayê di vê romanê de jî mêjiyê mirovî qet tevîhev nabe. Yanî xwîner nabêje “ka min çi fêm nekir, çavê min li çi neket ku hatim vir!”. Dibe hinek kes vewek qelsiya romanê bibînin; lê bi ya min

serkeftin e. Pîrbal bûyer xweş honandine û di hev de asê û winda nekirine.

Bi ya min divê pirtûka serkeftî hestên mirovan hişyar bike, rake pîya. Di vê pirtûkê de herî zêde hestê dexesîyê. Di nav me Kurdan de hesteke herî hişyar û dijwar. Mirov dema dibîne bê wê bûyer ber bi ku ve biçe, di wê gavê de dixwaze biçe û wî kesê xirab bikuje.

Lê di vê pirtûkê de jî Pîrbal bi hostayî hestên mirovî yên kesa tevî hestên neteweyî û civakî dike. Kurdayetiyê bi xwe dihesîne. Jîr e, zîrek e. Têkiliyên demkî û kesa, xweş tîr girêdan bi rewş û psîkolojiya Kurdan ve.


Wek mînak, Pîrbal têkilîya lehengê xwe ya zayendî bi Kurdbûna wî ve wiha girêdide: “Min sond xwaribû, şîrê dayika min li min ne helal be, ku ez ji xeynî tirk û faris û bi taybetî jina ereb zinê li gel jinên qewmekî din bikim.” (r.43) Di cîyekî din de wiha dibêje: “Min çêjeke yekcar xweş û bêpayan ji wan jinên ereb û tirk û faris distend... Ev yek bibû şêwaza xebata min a neteweyî.” (r.45) Û ev hevoka enteresan: “Tu dixwazî min bihetikînî û bi vêya neteweya min piçûk bixînî... Bîst û sê dewletên we [ereb] hene, dixwazim ji her dewleteke we, jinekê têxim bin tuxmê xwe.” (r. 80) Ya rastî min ji vê nêrînê qet hez nekir. Ne ji ber mêjîyê patriarkal û zayendparêz bi tenê. Nikarim têbigihîjim bê hevşabûn çawa dibe mijara tolhildanê. Ji ber ku wek perestî û pîrozkirinekê difikirim, hevşabûnê. Û mirov çawa dikare dijminê xwe bi ramûsanana ciza bike! Nakokîyeke dijwar. Ferhad bi hêrs e li hemberî zilm û dagirkeriya tirk û ereb û farisan. Ji ber ku ji Kurdistana bindestê Ereban e, herî zêde hêrs û rîka wî li hemberî wan e.

Digel vîna Pîrbal di vê romanê de jî danberheva rojhilat û rojava dike. Weke mînak: “Sedan jin li vê Ewropayê eqlê xwe berdidan, bi pereyên ereban an jî bi milk û malên van zilamên dewlemend ên ji rojhilat, ji bo seyaheta seksê diçin Moldovya û Belerûsya.” (r.29) Ji bo têgihîştina zewacê ya li welatên rojava jî wiha dinivîse: “Jin û mêranî peymaneke civakî ye û hew! Pêdivî ji bo temen heye, wexta jin û mêr dikevin payiza temenê xwe dizewicin.” (r.38)

Di vê romanê de xaleke herî balkêş jî çîroka Medûsa ye. Medûsa di mîtolojiya Yewnan de li perestgeha Athena jineke delal û porzer e. Dayika Pegasûs e. Athena keça Zeûs e, wek xwe-daya huner û aşîtiyê tê zanîn. Poseîdon jî xwe-dayê derya, erdhej û hespan e. Delalîya Medûsa, Poseîdon dike evîndarê xwe. Piştî Athena vê yekê dibihîze, ji delalîya Medûsayê diheside û li çav û porê wê tê xezebê. Êdî dibe jineke pormar û diran-tûj. Li çavên kê dinêre wan dike kevir. Û helbet têkilîyeke xurt di navbera vê mîtolojiyê û çîroka Ferhad û Ebû Ubeydeyê Xeddama de hatîye honandin.

Di vê romanê de Ebû Ubeydeyê Xeddama lehengê sereke ye. Kesayeta Ereba temsîl dike. Çawa di Hotel Europe de Mihemedê Hacîzade kesayeta Faris temsîl dikir. Û bi min wisa hat ku Ferhadê Kurd di her romaneke xwe de xwestîye xencerekê li singa dagirkerekî Kurdistanê bixe.

Û yek ji hevokên weke mîxekî di mêjî de cihê xwe digire jî ev e: “Divê tu genim li ber kevoka min nerijîn!”



HIŞÊ ÇÊKIRÎ YÊ KURDÎ

KEYO YEHYA ÇALÎ

CEO Û HEVDAMEZRÎNERÊ OVANYAYÊ

YEHYA@OVANYA.COM

**HEVPEYVÎN:
DIGIKURD**

Teknolojiya hişê çêkirî li dinyayê êdî berbelav e û di gelek amûrên ku em rojane bikartînin, wek trîmbêl, robot, telefona destan, kompîter û aplîkasyonên wan, bi hişê çêkirî dixebitin. Di vê teknolojiyê de êdî zimanê Kurdî jî cihê xwe digire. Bifikirin hûnê tekstekê Kurdî bixwînin û hişê çêkirî ji bo we binivîse, an jî hûnê bi telefona xwe ya mobîl re bi Kurdî biaxivin û bêjin telefonî diya min bike. Kîjan Kurd vê rehetiyê naxwaze? Şîrketekê bi navê Ovanya li Başûrê Kurdistanê Hişê Çêkirî yê Kurdî ava kir. Damezrîner û CEOyê Ovanyayê Keyo Yehya Çalî re derheqê hişê çêkirî û kar û xebatên xwe de bersiv da pirsên me. Hûrguliyên projeya hişê çêkirî yê Kurdî di hevpeyvîna me de ye.



Ez dixwazim wiha destpê bikim, beriya her tiştî tu dikarî ji me re bêjî ka hişê çêkirî yan jî hişmendiya destkariyê çi ye?

Hişê çêkirî şiyana komputer û amûrên dijîtal (wek robotan) e ku wek mirovên hişmend bikarin tevbigerin li himber mijar û pirsgirêk û karên ku girêdayî hizirîn û şiyarên mirovan in. Roj bi roj em mînakên zêdetir ji hişê çêkirî dibînin di mijarên cuda cuda yê jiyana şexsî û ya profesyonel de. Mînakek, dikare teknolojiya deng ji bo nivîsê an nivîs ji bo dengî be, mînakeke din, dikare erebeyên bê şofêr be. Çend beşên cuda yê hişê çêkirî jî hene li gor datayên ku dikevin berdestê wê sistêmê, ji bo mînak avahiya hişekê çêkirîyê ku bikare wêneyan nas bike gelek cuda ye ji avahiya hişekê çêkirîyê ku pêşbîniya aboriya şirketekê bike.

Di teknolojiya îro de cihê hişê çêkirî (AI) çi ye?

Hişê çêkirî xwe ispat kiriye di kar û pişesaziyên cuda de, êdî beşek gelek mezin ya jiyana me ya rojane li xwe digire û jiyana

me hêsantir dike. Şaşiyên mirovan di karên dubare û rutînî de gelek kêmkirine, û ev îmkân daye sazî û şirketên mezin ku bi hêsantî bikarin li ser datayên mezin (big data) bixebitin. Ji aliyekî din jî em dikarin destpêka sedsala 21ê wek destpêka şoreşa hişê çêkirî bidin nasîn.

Baş e, di teknolojiya hişê çêkirî de zimanê Kurdî di kîjan astê de ye? Hişê çêkirî yê Kurdî tê çi wateyê û wê bi kêrî çi bê?

Hişê çêkirî ji bo zimanê Kurdî û hişê çêkirî ji bo Kurdan an li Kurdistanê du mijarên ji hev cuda ne, vê dibêjim ji ber ku gelek kes van ji hev cuda nakin. Hişê çêkirî ji bo zimanê Kurdî zêdetir wan xizmetguzarî û bername û sisteman li xwe digre ku bi awayekî hewil didin ji zimanê Kurdî fêhm bikin û karekî li gor nivîsek diyarkirî bikin an jî bikare bi Kurdî binivîse ji encama fêrbûnek kûr. Mînakek wê bernameyêke ku bikare wêneyê nivîsên Kurdî bike nivîsa dijîtal, mînakek din dikare bernameyek be ku dema nivîseka bi Kurdî dixwîne dizane ka ev nivîs negatîf e an pozîtîf e, ka mijara wê nivîsê edebiyat e an dîrok... girîngiya hişê çêkirî ji bo Kurdî bi dîtina min



bi awayekî girêdayî girîngiya mana zimanê Kurdî ye di vê çaxa nû de. Ku em bikarin Kurdî hînî bernamêyên cuda bikin dê ew jî bikarin jiyana me ya nû bi Kurdî bixemilînin û jiyana bi Kurdî hêsantir û pêşketîr bikin.

Hişê çêkirî yê Kurdî wê çawa jiyana me hêsantir bike? Emê ji bo kîjan kar, pîşe û sektoran wê bikarbînin? Bi mînakan dikarî behs bikî?

Ji ber ku bi awayekî kiriyarkî hişê çêkirî demek gelek dirêj nîne cihê xwe vekirîye, ne tenê ji bo zimanê Kurdî lê ji bo gelek zimanên xwedîdewlet û hikûmet û saziyê mezin jî hê pêşveçûnên berçav nehatine dîtin, an ku hebin jî li astek zêde bilind nînin. Loma jî derfetek gelek baş e ku em Kurd jî xwe bigihînin vê teknolojiyê an zanista nû û Kurdî bixin nav makîneyên wê yên cuda cuda de. Gelek ji wan makîneyên hişê çêkirî niha berhev in û rê didin zimanê bê zêdekirin û ne hewce ye em ji nû ve wan makîneyan ava bikin, mîna Google Translaterê an jî makîneyên OCRê an jî yên deng ji bo nivîs û nivîs ji bo deng, û cihê hêvî û dilxweşiyê ye dema em ciwanên Kurd dibînin daneyan bi awayên cuda berhev dikin ji bo wan makîneyan û Kurdî zêde dikin. Lê ji bo gelek mijaran jî ji ber ku ew makîne girtî ne û xwediyên wan bi awayekî taybet û li ba xwe zimanan zêde dikin, em neçar dimînin wan makîneyan ava bikin. Hişê çêkirî dikare gelek alîkariya medyayên me an dezgehên nivîs û çapemenî û arşîvan bike. OCR (wêne ji bo nivîs), rastkirina şaşiyên rênivîsî û rêzimanî, vebeşîna arşîvan û nivîsan li gor mijarên wan û naveroka wan, lêgerîna kûr ji bo nivîsên Kurdî, ev hin ji wan mînakên berçav in ku dikarin ji aliyê saziyan ve bê bikaranîn. Wekî din jî ji bo xelkê normal dikare gelek mifa hebe wek makîneyên werger û deng bo nivîsê. Pîr û nexwendayên me dê bikarin bi dengê xwe ji telefona xwe re bêjin telefona filan kesî bike

ji bo mînak.

Şirketa te Ovanya li Başûrê Kurdistanê niha çi xebat û proje dimeşînin? Li giştîyê Kurdistanê û cîhanê bazara hişê çêkirî yê Kurdî heye gelo?


Dema me destpê kir, yekem projeya me bi OCR (wêne bo nivîs) a Kurdî destpê kir, me paşê guhart û mezintir kir û biryar da gelek makîneyên din lê zêde bikin ku sazî û şirket bikarin di kar û projeyên xwe de bikarbînin. Dema me ew şiyana di xwe de dît û serkeftina wê makîneyê bi çavên xwe dît, me biryar da di beşên din de jî bixebitin û hişê çêkirî ji bo gelek projeyên din zêde bikin. Gelek makîneyên hişê çêkirî hene ku ne tenê bi zimanê Kurdî re girêdayî ne û cîhanî ne (mîna wan teknolojiyan yên ku karê wan bi wêneyan an datayên hijmarkî re ye), dema makîneyên wisa yên xurt û pêşketî bîn çêkîrin û bikarin pirsgirêkekê çareser bikin, dikarin li her dera cîhanê û li her wîlatakî bîn bikaranîn. Lê yên ku bi ziman re girêdayî ne divê ji bo mebesta fêmkirina xebitîna li ser wî zimanî re bîn bikaranîn. Niha ji bo marketingê bi taybet derfet gelek baş e ku ev makîneyên me yên vebeşîna nivîsan û fêmkirina ji nivîsên Kurdî bîn bikaranîn. Em tenê li ser hişê çêkirî û Data Scienceê (zanista datayan) dixebitin. Niha em li ser du projeyên gelek balkêş dixebitin; yek ji wan pirojeyeka mezin e di marketingê de ku bi yek ji şirketên mezinên marketingê re hevbeş li ser dix-



ebitîn, dê marketinga Kurdistanê (li başûr ji bo niha) bigihîne astek nêvdewletî û bilindtir ji berê, ev projeyek e ku marketinga traditional bi ya nû û hevçax re girê dide bi rêya hişê çêkirî. Projeyek din jî bi yek ji medyayê herî mezinên Kurdistanê re em li ser dixebitin, ew jî makîneya rastkirina şaşiyên rêzimanî û rênivîsê ye, dê gelek mifadar be him ji bo xelkê û him jî ji bo sazîyên ku bi ziman re dixebitin.

Hedef û armanca we ya sereke çi ne?

Armanca me destpêkê tenê OCR (nivîs ji bo wêneyan) paşê dema me serkeftina wê dît û me ew şîyan di xwe de dîtin me nêrî ku em dikarin hişê çêkirî di gelek aliyên din de jî bi cih bikin û biceribînin. Me çi qas zêdetir didît û em çi qas zêdetir kûr dibûn zêdetir ji bo me zelal dibû ku bi rastî dema wê ye em niha bi hemû şîyanên xwe hewl bidin vê hişmendiya ku data girîng in li Kurdistanê bilav bikin, ji bo me ji businessê zêdetir e niha. Her ku diçe em wek xelk jî û sazî û şirket û karwerên me jî zêdetir datayan çêdikin û zêdetir bi datayan re dixebitin, me valahiyek dît ku cihê hişê çêkirî û data scienceê vala ye û divê bi cih bibe, dema data hebin divê makîneyên wan jî hebin ku em bikarin bi awayek pêşketî bixebitin. Ez xweşbîn û piştrast im ji vê ku dê di demê nêz de gelek sazî û şirket berê xwe bidin hişê çêkirî û dê bi girîngiya wê bihesin, ya em wek Ovanya dikin ev e vê pêvajoyê bileztir bikin û dema ew amadeyî




çêdibe şirketek hebe û berhev be wan xwestekan bi cih bîne. Ya li ber me niha ev e em şirketa xwe mezin bikin û bi wê mezinkirinê re jî wê hişmendiyê bilav bikin û jîngehek wisa ava bikin ku zêdetir girîngiyê bi datayan bide û jê fêr bike.

Ez meraq dikim di demê nêz de hişê Kurdî yê çêkirî dê bikare ji aliyê firmayên navdewletî ya teknolojiyê ve jî bê bikaranîn? Ger wisa bibe nirxa zimanê Kurdî jî dê li ber zimanên navdewletî bilindtir bibe, ne wisa?

Helbet, wek min got ji ber ku teknolojiyek nû ye, gelek ziman hene ku li paş mane û Kurdî ne tenê ye di vê mijarê de. Lê ev jî bi awayekî cihê hêviyê ye ku em bikarin demê zû de Kurdî di beşên wê yên cuda cuda de pêş bixin û zêde bikin. Ji bo mînak şirketa Facebookê naveroka zimanê Îngîlîzî fêr dike û li gor wê pêşniyaran dike û marketingê hêsantir û pêşketîr dike, ev ku bikare wê ji bo zimanê Kurdî bike asta Kurdî jî bilindtir dike û dê alîkariya civakê jî bike. Ji aliyekê din jî ku em lê binêrin cîhana îro cîhanek dijîtal e û her ku diçe em kûrtir dikevin nav dijîtal bûnê, ku Kurdî jî bixwaze bêje ez heme divê van makîneyan hînî zimanê xwe bike.

Ev pirs min bila ji bo meraqdarên data science û kodnivîsiyê re be. Kesên ku bixwazin van zanistan hîn bibin dive çi bikin? Qesta min ne tenê çûna zaningehan e, pêşniyar in te çi ne?

Gelek kar hene mîna bizîşkiyê, an gelek beşên endazyariyê û zanistên bingehîn ku ji bilî xwendin û xebatek diyarkirî û gelek taybetîr û xwedî rêbazên xwe yên zanistî, divê belgeyek jî hebe ku nîşan bide kesekî/ê hin qonax derbas kirine û niha cihê baweriyê ye ku bixebite di wî warî de. Lê berevajî wan gelek kar jî hene mîna siyasat û edebiyat û huner û bernamenivîsiyê ku ne hewce ye tu bi hin qonaxên diyarkirî re derbas bibî ku hin kesên din (an komekê) diyarkirî bin ji bo me, kesek dikare bi xwe rêya xwe bibîne û bi xwe li gor tecrubeya xwe û xwendin û hewlên xwe xwe pêşve bibe û hîn



bibe û heta karek gelek serkeftî jî bike. Data Science û bi giştî jî bernamenivîsî karek wisa ye, ne tenê bi dîtina min lê ev bawerî çêbûye ku ji bo salên li ber me divê her kes xwe hînî bernamenivîsiyê bike ku bikare bixebite di karek zanistî de. Niha zarokê dikare bi tena serê xwe tenê li ser înternetê hînî bernamenivîsiya website û lîstikên komputerê bibe, kesek dikare bi sê mehan xwe baş hînî bingehên bernamenivîsiyê bike, sê mehên din lê zêde bike û bikeve nav beşekê de dest bi karekî bike, sê mehên din lê zêde bike dê bikare li ser projeyek mezin bixebite wek endazyarek. Helbet cudahî di navbera beşên cuda yê bernamenivîsiyê de jî hene, data science ne tenê bernamenivîsî ye; bernamenivîsî beşek e ji wê, divê di heman demê de matematîkek baş jî bizanî û di mijara ku li ser dixebitî jî lêkolînek baş bikî. Pêşniyara min ji bo meraqdarên data scienceê ev e ku pêşî bi awayek bingehîn xwe hînî bernamenivîsiyê bikin û paşê li ser matematîkê bixebitin (hinekê ne zêde), qursên online û bê beramber gelek in û gelek websitayên mîna Kaggle.com ê jî hene ku datasetan berdest dikin ji bo ku bikarin li wir şiyayên xwe biceribînin û kar û projeyên xelkê jî bibînin.

Teknolojiya “data science” mirovan hinek ditirsîne. Lewra daneyên kesane/şexsî jî têne berhevkirin. Mirov çawa dikare pê bawer bibe ku bi niyeteke xirab neyên bikaranîn?

Yek ji sedemên ku em data scienceê bi vî awayî dibînin, propandayên mezin in ku şirketên mezin li dijî hev digêrin û hewl didin bi awayekî aboriya wê şirketê têk bidin. Bi navên cuda cuda komkirina datayan tê rexnekirin û gelek ji wan mafdar in jî, lê em ji bîr dikin ku piraniya caran zêdetir alîkariya me û jiyana me ya îro dikin. Berê rêzefilm dema dihatin berhemînan li ser dîtina û hîzrên kesekî an komek diyarkîrî çêdibûn, niha datayên me (ev ka em zêdetir çî mêze dikin, ka em zêdetir çî rexne dikin û zêdetir çî dipejirînin) hemû tîr berçav girtin û rêzefilmek zêdetir nêzî xwastên me çêdibe, ev mînakêk taybet bû lê eynî tişt di mijarên din de jî rast e. Niha bi rojane datayên nexweşan û testên wan alîkariya şirket û saziyên mezinên tendirûstiyê dikin û me bi leztir digihînin çareseriyên. Şirketên erebeyan û balafir û keştiyan rojane (petabyte) an kom dikin ku bikarin makîneyên baştir çêbikin, makîneyên ku

zêdetir jîngedost in û bi enerjîyek kêmtir karek zêdetir bikin. Dema em li wêneyê mezintir binêrin em dibînin ku ew qenciyan ku data science di derheq mirovatiyê de di her warî de dike ew qas mezin in ku xirabiyên wê nayên dîtina û gelek kêr û biçûk dibin. Di mijara social media û jiyana rojane ya mirovan de jî eynî tişt heye, gelek ji van bernamenivîsî platformên ku jiyana me hêsantir dikin bi data û çalakiyên me wisa baştir û hêsantir dibin.

Saet xweş, gotina te ya dawiyê heye?

Yek ji wan tiştên ku gelek dixwazim di van çend salan de bibînim ev e ku Kurd jî bibin yek ji wan gelên gelek çalak di hişê çêkirî û data scienceê de, ji bo wê ne hewce ye dewleta me jî hebe, ne hewce ye şirketên çend milyarî li Kurdistanê hebin, tenê komputer û înternet pêwîst in. Niha ji bo komputerên gelek bihêz û bilez jî zêde pirs-girêk nîne, cloud computing û serverên gelek baş dikarin wê jî çareser bikin. Ya dimîne ev e; em civakê amade bikin ku girîngiya hişê çêkirî bizane û di her beşek û warekê ve jiyane de bi cî bike, û dê alîkariya me bike di vê serdema nû de xwe jî baştir û zelaltir bidin nasîn û xwe pêş bixin. Me gelek derfet ji dest dane ku dema wan derbas bûye û êdî dereng e, lê hişê çêkirî nû destpê dike ji bo hemû cîhanê, çima em jî beşdar nebin!

Zor spas dikim Keyo Yehya Çalî. Bi rastî zor xweşhal bûm bi nasîna te û her serkeftina we dixwazim.

HÛNERA DIJÎTAL



HOGIR AR
hogirar0@outlook.com

Hogir Ar



Hunera ku bi tevahî rêbazên di derbirîna hest, sêwirandin an jî xweşikbûnekê de tê bi kar anîn û afirîneriya bilind a ku di encama vê îfadeyê de derdikeve pêş, di heyama hezar salan heta îro pêşketineke cûda û berdewam nîşan daye.

Di dîroka hunerê de derketina kamerayê dikare wekî xala şikestinekê were hesabandin. Hunermendên serdemê berê xwe dane lêgerînên nû; daxwazên xwe yên wekî girtina kêliyê, dîtina ronahiyê û ronîkirina wê anîn ziman. Ji ber vê yekê, rêgezên bingehîn ên teqlîdkirina xwezayê û wênesaziya kevneşopî ya akademîk hatine pirsîn û nêrînên nû, ramanên nû derketine holê ku serhildanek li dijî van rêbazan e. Rengên wek reş, spî û qehweyî hatin avêtin û rengên prîzmatîk hatin bi kar anîn. Mantiqa kevneşopî ya dîtîne hate hilweşandin û xwezayek zindîtir, ronahiyek ku li gorî zagonên optîkî hatî xuyakirin/afirandin, û xeyala ku di ronahiya atolyeyê de dihat afirandin li kevîyekî ma.

Pop Art ku wekî dawiya serdema nûjen û destpêka derbasbûna serdema postmodern tê qebûlkirin û yekem car li Londonê derketiye holê, bi têkiliya wêneya fotografî re çêbû. Salên 1900î serdemek bû ku tê de bajarîbûn berbelav bû û pîşesazî, mekanîzma pêş ket. Ji ber vê yekê hunermendê ku li nûbûn û orîjînalîteyê digere, îdeolojî, çandî û bandorên jiyana hemdem di berhemên xwe de nîşan dane da ku li gorî rojane bandoreke mezin bike. Hunermendên din ên serdemê jî di berhemên xwe de bal kişandin ser guherîna çanda serfêkirinê ya bi bandora mekanîzekirinê û di vî warî de berhemên xwe pêşkêş kirin, bo vê yekê têkilîya hunera bi teknolojiyê re bi hev re pêşketin ne dijwar bû. Dîroka hunerê ku bûye şahidê gelek tevgerên hunerî, bi hunera dijîtal re li gorî taybetmendiyên pêşketin

û teknolojiya civaka agahdarî de serdema teknolojiya îroyîn de ketiye serdemek nû. Destpêka “hunera dijîtal” û berhemên wê yên ku di salên 1990î de derketine, vedigere salên 1960î. Birastî ev pêngava hunera dijîtal bû (digital art) dikarim wiha kurtebir bikim: “Xebera huner û teknolojiyê bi derbasbûna ji serdema pîşesaziyê ber bi qada elektronîkî ve bûye.”

Hunera dijîtal, bi gelemperî, rengê hunerî ye ku bi hilberîna tiştên ne fîzîkî pêk tê, tê de komputer rolek mezin dilîze. Hunera dijîtal qadek berfireh e ku hemî karên hunerî, serlêdan û derketinên ku bi kar anîna teknolojiyên dijîtal ve tê de di-hewîne. Ji salên 1960an vir ve, bi navên cûrbecûr yên wekî “hunera kompîturê” û “hunera multimedia”yê ji bo vî warî hatine bikaranîn û herî dawî jî pênaseya “hunera dijîtal” wekî şaxek ji têgeha hunera medya-

yê destpê kiriye. Ji ber ku cîhê komputeran di jiyana me de roj bi roj zêde dibe, şaxên hunera kevneşopî yên xêzkirin, resim û peykersaziyê destpê kir ku li şûna hunera ku di hawîrdorek komputerkirî de di bin sernavên (hunera torê/ağ Art), “hunera çîroka (kurgu) dijîtal” û “hunera xeyalî ya dijîtal” de hatî pêşve xistin, cîhê komputeran di jiyana me de zêde dibe. “Rastiya virtual” yanî ber bi jiyaneke sanal ve em diçin.

Ger em şaxên herî berbiçav ên hunera dijîtal navnîşan bikin divê em ji van destpê bikin.

Computer Art, Computer Graphics, Illustration dijîtal, Dîjîtal Painting, Photography dijîtal, Muzîka Pêşkeftî ya Computer, Hunera Fractal, efektên Filmê Taybet, Motion Chart,

Manîpulyasyona Wêne , Video Art, Sêwirana listika vîdyoyê û graffik.

Hunera dijîtal bi îcadên wênekêşiya tevgerê di dawiya sedsala 19an de tê şopandin û hingê li derdikeve holê. Di vê pêşveçûna teknolojiya vîdyoyê di salên 60an de, performansa multimedia jî di hunerê de cih girt. Di salên 90î de bi pêşketina hunera dijîtal re, temaşevan jî tevî bûn lê di hunera Kurdî de dema min beşeke afirand tarz û stîleke min çar sal xebitî ser vê hunerê û demên dawî de pêşkêşî hunera cîhanê kir. Pêşxistina teknolojiyê di warên hunerî û çandî de guherînan tîne pêşkêşkirina îmkânên nû, dijwarkirina hunera kevneşopî, pêşandanên fermî û formên vegotinê yên nû diafirîne.

Ji bo vê huner, em dikarin bibêjin ku gotin û vegotina hest û ramanên mirovan bi amûr û rastiyan cîhêreng, bedewbûnî bi hunerê tîne afirandin. Ew bi huner re gengaz e ku jiyane bi rûmet bike û wê watedar bike. Huner dikare di her qada jiyane de hêz û kêfê bide mirovan.

Ji bo ku em bikaribin li ber cûrbecûr guhêrbar û bileziya guhertinê, daxwaz û bendewariyên bêdawî yên di temenê xwe de bihêlin, û li dijî rastiyan ku em negatîf dibînin têkoşînek pêwîst bîdin, pêdivî ye ku em fahmkirina, fikirkirina cîhana nû fêr bibin ev bo gelê Kurd pêngavên hunerî ne. Huner berhemeke civakî ye. Ji bo pêkhatina hunerê civak teqez pêwîst e. Bi gotineke din rastiya mirov çêkerê hunerê ye. Huner bê mirov nabe; huner wekî qadeke





hilberînê ya dinyayî û însanî rasterast bi mirov, civak û çandê ve girêdayî ye. Huner ji bilî ravekirin û têgihîştinên derûnî, felsefî, estetîk rê dide ravekirinên civakî, angososyolojîka civakê. Hunermend li hemberî civaka xwe berpirsiyar e, bi pirsgirêkên civakê re têkildar e, lewma bi hesta erka civakî tê barkirin. Huner berpirsiyariyek e û ji bo pêşkeftina civakî peywiran digire ser xwe. Erka hunerê bihîstina dengê civakê di çav û wijdanê hunermend de ye. Huner jî mîna hemû kirinên mirovî, nikare bi tevahî ji berpirsiyariya civakî were dûr xistin, nikare xwe ji rêveçûna civakê û rewşa pêkhateya civakî dûr bixe.

JI BO BOOMERAN* NFT ÇI YE ?



ARAM TASTEKIN

Lîstikvan - Dramaturge – Hunermendê NFTyê

<https://twitter.com/AramiTastekin>

aram.tastekin@gmail.com



*Boomer: Ev biwêj ji aliyê "millennials" ve tê bikaranîn, wekî din wekî "Nifşa Y"yê tê zanîn ku tê de mirovên di navbera 1980 û 1999an de ji dayik bûne hene. Bi wan re mezhebeke din, "post-millennials" ku ji sala 2000î de ji dayik bûne, pê re tê.

Ez çima JPGyê bikirim?

Ger ez dîmenê NFTya te daxim ser kompîtûra xwe nexwe NFTya min jî heye?

Belê, çima ez JPGyê (*Joint Photographic Expert Group. Armanca JPGyê ew e ku mezinahiya wêneyê kêr bike lê kalîteya wê ya rast biparêze.*) bikirim? Çima ez berhemêke hunerî bikirim? NFT di dawiyê de ji bo hunermend, berhevkar û berhemên hunerî navgînek nû ye. Ev yek dihêle ku projeyên hunerî yên bedew, bi rengekî din fînanse bike. Ev qadeke nû ya hîmayekirina qada berhemên hunerî ye ku piştgiriyê dide huner û hunermendan. Bi ser de jî hişt ku gelek hunermend nêzikî rîyeke nû ya afirandinê bibin. Erê, bêguman, tu dikarî NFTya kesekî daxî, wê hilînî an jî wek tabloyekê li mala xwe daliqînî. Ev fikreke pir xweş e, ji ber ku ez bi xwe, li mala min kopiyêke Picasso heye û ne gengaz e ku meriv bizane ka ew berhema orjînal e an ya derewîn e. Lê ne xema min e, bi saya

teknolojiya zincîra blokê, NFTya min wê tu carî winda nebe, ji ber ku ew her û her di zincîra blokê de digel hemî agahdariya pê ve girêdayî, tê tomarkirin. Di encamê de, NFTya te ji her karê laşî pir ewletir e.

Belê lê ev qadeke spekulatîf e?

Erê NFTyên spekulatîf hene, lê dîsa jî ji ber ku bazara hunerê heye, huner rîyeke spekulasyonê ye, huner rîyek e ku hûn pereyên xwe didin razandin. Ew bazareke nû ye, her tişt bi lez dimeşe, lê ev nîşan nade ku ew qadeke spekulatîf e.

NFT gerdûnê qirêj dikin.

Erê qirêj dikin, rast e. Lê gelo danûstendinek ji hemî peyamên nivîskî yên ku hûn ê ji bo sersalê ji hemî têkiliyên xwe re bişînin bêtir qirêj dike? An jî hemî vîdyoyên ku hûn bi rêkûpêk ji têkiliyên xwe re dişînin da ku wan kêfxweş bikin bêtir? An jî ji hemî reklamên ku hûn distînin ji ber ku nayê bîra we hûn ji gelek bultenan nebin? Hewce ye meriv li ser vê rastiye bifikire ku erê ew qirêj dike, lê ji bo berhevdanê ew pir hindik e, nemaze li pêşberî bazara hunera "kevneşopî". Ger em bixwazin kêmtir qirêj bikin, divê di warên din de jî gelek hewl bê dayîn. Wekî din, NFT ji bo van pirsgrêkan civakeke baldar e, ji ber ku niha zincîreyên eko-berpirsiyar ên mîna Tezosê (*pereyê krîptoyê ye ku li ser zincîra blokê ye û bi platformeke kompîtûrê ya nenavendî ve girêdayî ye.*) hene.



► NFT: Bager Kaya - Moldy-melon-and-dry-flowers

Wekî her tiştî di nav 10 salan de wê modaya vê jî derbas bibe.

Tiştê ku mirovan ji teknolojiyê yan jî ji destpêka înternetê re digot tam ev e. Lêbelê, divê were fêmkirin ku bi her pêşveçûneke mezin re mirovên ku bi tevahî fêm nakin û red dikin hene. Lêbelê, kes nikare pêşbîniya pêşerojê bike.

Crypto pereyê rastîn e?

Ew pereyê pêşerojê ye, ji ber ku pereyê wereqê mehkûmî windabûnê ye. Bi pereyê krîptoyê ez dibim banka xwe, şewirmendê xwe.

Bê feyde ye, mirov ji kaxezê hez dike, ji destdana kaxezê hez dike.

Tu çend caran dest didî wêneyên xwe? Tiştê ku girîng e ne hewce ye ku hûn berhemên xwe li odeya xwe ya rûniştinê nîşan bidin da ku hûn bikarin dest bidinê, lê hûn dikarin li her derê û her demê bi awayekî ewle berhemên xwe nîşanî her kesî bidin. Wekî din, heke berhevokeke we ya girîng a karên hunerî hebe, ne gengaz e ku hûn her tiştî li malê daliqînin. Em di rêyêke nû ya berhevkirinê de ne, em awayê bikaranîna hunerê, xwedîkirina wê, parvekirina wê diguherînin.

Ez bawer im niha tu amade yî ji bo stendina NFTyan. An jî tu bixwazî agahiyên zêdetir ên li ser NFTyan bistîni tu dikarî bi me re têkilîyê deynî.



► NFT: Koshe Salayi - Marjan

ÇÎROKA VEGERANDINA GURAN LI PARKA NETEWYÎ YA YELLOWSTONEYÊ Û DUBAREYA MODÊLEK MÎNA WÊ LI BAKURÊ SÛRIYÊ





DALEEL HAGY


Damezrîner û Revebirê
Trees Against Povertyê


Trees Against Poverty


pargîdaniyek civakî û ne qezenc e,
ku wekî pargîdaniyek berjewendiya
civakê ya ku bi garantiyê li
Keyaniya Yekbûyî sînorkirî hatî
tomarkirin. Hûn dikarin zêdetir
hûrgûlîyan li ser malperên me
bibînin:

 treesagainstopoverty.org

 [TreesAgainstPoverty](https://www.facebook.com/TreesAgainstPoverty)

 [tree_vs_poverty](https://twitter.com/tree_vs_poverty)

 [company/trees-against-poverty](https://www.linkedin.com/company/trees-against-poverty)

 [treesagainstopoverty](https://www.instagram.com/treesagainstopoverty)



Di dawiya salên 1920an de, gur li Parka Neteweyî ya Yellowstone ya Dewletên Yekbûyî hatin nêçîrkin û hemî gurên li parkê hatin kuştin.

Di 70 salên din ên nebûna guran de, tevahiya ekosîstema Yellowstone ji hevsengiyê ketibû. Hejmara wawikan pir zêde bû û nifûsa pezkoviyên ewqas zêde bibû ku hemû darên piçûk û çiloyan dixwarin. Û îmkân nemabû ku dar, carekî din bigihên û di encamê de hejmara darên bî û spîndar tune bû. Bêyî wan daran, çûk jî hêdî hêdî çûn, segavan êdî nikaribûn bendavên xwe ava bikin û qeraxên çeman riziyan. Bêyî bendavên segavan û siya daran û nebatên din, germahiya avê ji bo masiyên ava sar pir zêde bû.

Di sala 1995an de, 14 gur li Kanadayê hatin girtin û ew li Parka Neteweyî ya Yellowstoneê hatin berdan. Zanyaran baş dizanibûn ku gur, wekî nêçîrvanê herî mezin, di vê ekosîstemê de perçeya wînda ne. Lê ew matmayî man ku vegera guran çiqas zû veguhertinek teşwîq kir.

Ji nû ve hatina guran di ekosîstema Yellowstone û erd-

nîgariya wê ya fizîkî de bû sedema guhertineke nepayî. Pêvajoya guherînê bandorek erênî li ser heywan û nebatên heyî kir.

Keriyên pezkoviyên tavilê dest bi bersivdayînê kirin. Di nav 10 salan de, darên bî ji nû ve rabûn. Di 20 salî de, spîndar gihan. Beravên çem stabîl bûn. Hewêrde jî wek segav, êlo, rovî û qurebeşkan vegeyan.

Pezkovî: Rast e, gur pezkoviyên dikujin, nifûsa wan kêmtir dibe, lê gur tevgera pezkovî jî diguherîne. Dema gur bi ser wan de diçin, pezkovî zêde naçêrin û bêtir li dora xwe digerin, axê bi hewa dikin.

Giya û Dar: Di encama guherîna adetên xwarina pezkoviyên de, newalên bi çêre û hêşîn cardin nû bûn. Darên li parkê tenê di şeş salan de bi qasî pênc qat ji bilindahiya berê mezin bûn!

Çûk û Hirç: Wan darên nû û mezintir ji bo çivîkên dengbêj (hewêrde) cihê jiyandê peyda kirin û ji bo hirç bixwin jî mewij û fêkî gihandin. Hirçên sax (bi sihhet) dîv re bêtir pezkovî kuştin, beşdarî wê çerxê bûn ku guran dabû destpêkirin.

Segavî û heywanên din: Dar û nebat jî hişt ku nifûsa segavan geş bibe. Adetên wan ên çêkirina bendavan ji bo koremişk, amfibiyan, werdek, masî, xişok û segavî jîngeh peyda dikirin.

Heywanên guhandar: Gur guhandaran jî dikujin, bi vî awayî nifûsa kîvroşk û mişkan zêde dikin. Ev çavkaniyek xwarinê ya mezin ji bo baz, xecxecok, rovî û qurebeşkan çêdike.

Beraxwer/Leşxwer: Qijik û êloyên keçel jî ji nêçîrên heywanên guhandar yê qereşe dixwin.

Ya herî sosret, erd: Erozyona axê di rêça çem de gelek cûdahiyek çêkiribû. Lê ji ber ku pezkovî sil û li ser piyan e û bêtir nebat li teniştê çeman zêde dibin, qeraxên çem aram bûn. Niha, guran erdnîgariya fizîkî ya Yellowstoneê guhertine.

Çîroka ji nû ve vegeandina guran nîşan dide ku her endamekê ekosîstemê ji bo wê erdingariyê çiqas girîng in.



Pirsgirêka windabûna gurên li Parka Yellowstoneê jî mîna ya ku li Bakurê Sûriyeyê diqewime ye. Herêma Bakurê Sûriyê û Herêma Kurdistana Iraqê berê daristanên savanna bûn. Berî çend dehsalan, qata darê bi piranî ji ber gelek faktorên hate rakirin. Di encamê de sewalan xwarin û jîngeha xwe ji dest dan û zincîra xwarinê hat şikandin û bû sedema windabûna ajalên din ên herêmê. Li herêmê gelek celeb mirin.

Rakirina daran bû sedem ku germahî zêde bibe. Giya bêtir rastî tîrêja tavê hat û firehiya qatên giya ji nişkêva kêm bûn û di dawiyê de jî mirin. Kêzik û ajalên ku nebatan dixwin jîngeha xwe û çavkaniya xwarinê winda kirin. Alektorîs, genimê Kurd, zozanên tacdar, streptopelya, hudhudk, tîfî, hamsterê sûrî û cureyên jîjuyan stargeh û çavkaniya xwe ya xwarinê winda kirine. An ew winda bûne an jî nifûsa wan li herêmê pir kêm bûye.

Wendakirina van ajalan bû sedem ku çûkên din ên mîna başok û teyrê boz ku nêçîra van çûkên piçûk dikin jî tune bibin.

Ajalên wek pezkovî û berazên kovî ku diçêrin jî çavkaniya xwe ya xwarinê winda kirin û li herêmê tune bûn. Vê yekê bandor li keftar û guran kir ku ew jî nêçîra van heywanên giyaxwer dikin. Niha li Bakurê Sûriyê nifûsa wan sifir e. Ev hêmanên zincîra xwarinê hêdfî hêdfî yek bi yek winda bûn û ev yek bandor li tevahiya jîngeha Bakurê Sûriyê kir.

Modela Yellowstone Parkê dikare li Bakurê Sûriyê bi vejerandina daran li herêmê were dubarekirin. Dar wê bibin miftaya bîngehîna a ji nû ve hevsengkirina ekosîstema li Bakurê Sûriyeyê. Çandina daran ne tenê çandina daran e, lê tê wateya sarkirina germahiyê, çêkirina stargeh û peydakirina çavkaniyên xwarinê ji çûk û ajalan re. Dar dê ji nû ve bibin hêmana daristanên û perestgehên xerabûyî, kêmkirina CO2 û têkoşîna bi guherîna avhewayê, afirandina qadên kesk ên ku bedewiyê hildiberînin û hawîrdora ku niştecih lê dijîn çêtir dikin, beşek ji nasnameya xwe ya çandî û başbûna derûnî vedigerin.

Çavkanî: *The Guardian*, *BBC*, *Yellowstone-Park.com*, *National Geographic*



BÊHÊVÎTÎ QEDEXE YE

Ji Tirkî: ZANA ZENGENÎ, 2016

m.zana47@gmail.com

Berfê da guliyên daran
Û kulîlkên te yên herî yeman çilmisîn
Dilo serî netewîne!
Lewra zivistan e dem û sal.
Zivistaneke reş û bêper
Û em dorpêçkirî ne ji çar aliyên.

Lê, bifikire dilo!
Li bihara ku dê bi şer were bidestxistin bifikir.
Li dost û ew bêwarên ku tédikoşin bifikir.
Dê zîl bidin tov ji bin berfê
bi hatîne vê havîne.

Dê her êşek te bi dilşadiyekê,
Têr û tîje derbas bibe.
Rêyek din tune ye dilê min.
Em ê bi saxî derkevin ji van êşan.

Çunkî bêhêvîti qedexe ye!
Û strîna stranên têkçûnê jî.
Çunkî artêşa hêviyê dimeşe
Û bi hêviyan bêhêvîtiyê dike.

| 1972 - Metin DEMİRTAŞ



Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingehêka sazgehîyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

Kovarên Endam



[W](#) [T](#) [F](#) [I](#) [Y](#) /KovargerênKurd
[✉ KovargerênKurd@gmail.com](mailto:KovargerênKurd@gmail.com)

The **Hall** Kurdî
Endama Koma Kovargerên Kurd e